Dmahîk: Pirtûkxana Kongirês

navê serokê diwem ya Emrîka " Con Ademz " li avahiyê bû .

- **Avahiya Medîson :**

Ta niha pirtûkxana Kongirêsê mezin dibe , ta ku " kwins Miyomford " neçar ma , ku pirojeya avakirina avahiyek siyem , li sala /1957/ an pêşkêş bike , li sala /1965/ an erêkirin avakirina wê bistîne , û kevirê bingehîn li sala /1974/ an dîne . Lê nehat vekirin ta sala /1981/ an bi beşdariya serok " Ronald Rîgên " . Û ew avahiya bi navê serokê çarem " Cêms Madîson " , bi nav bû . Kolankerê navdar " Hankok Waltir " pûtek ji Madîson re çêkir , û li ser dîwarên derdora pût , heyşt gotinên wî yên navdar li ser azadî , fêrbûn û zanînê kolan .

- **Berhem û arziyên pirtûkxana Kongirês :**

Bi kurtî li serjimara di oêşgotinê de hatî vegere ger tu dixwazî wê nas bikî . Lê , xelik ji hemî deverên Emerîka û cîhanê seyrana wê dikin , ji ber ku di nav xwe de piraniya dana ramanî , çandî û huneriya ademîzadiyê yên di navbera pir çerxan de hatine dicivîne . Ne tenê weha , ew pir perçeyên kevneşopî yên mezindarên Emrîkî jî di hundir xwe de kom dike jî .

Serok " Tomas Cêvirson " yekemîn Mishef wergerandî , li sala 1765 an wergirt . Serokê beşê daneriyê di pirtûkxana Kongirês de , guman dike ku serok " Cêvirson " ew Mushefa kirî , ji ber ku lêkolînên wî yên zagonî , pirî caran wek jêdereke Islamî nîşanî " Qurana " pîroz dikirin . Û " Mar" dibîne ku " Cêvirson " ronakbîr bû , û ne biyane ku ronakbîrekî weke wî hewil bike felsefa sincî yên olên din nasbike .

Wergera ku " Cêvirson " bi dest xwe xistiye , wergerandina " Corc Sîl e " , û ew yekemîn wergerandin bû , ku yekser " Quran " ji Erebî wergirî Ingilîzî . Hemî wergerên berî we , ji zimanê Firansî wergirîn Ingilîzî , wêlomê ji jihevş'etîbûn . Mushefa wergerandî di " Pirtûkxana Cêvirson " de , bi Mushef ". Dora /300/ hezar pirtûk bi zimanê Erebî û zimanên Rojhilata navîn ên din heye .

Cêvirson " bi nav dibe . Di beşê Rojhilata navîn û Efrîqiya de , li ser deriyên wê navên pêwîstirînê bajarên Erebî hatiye nivîsandin Ev beşa , di avahiya " Tomas Cêvirson " de ye . Yê ku di nav de eywana " Asiye " , eywana " Ewropa " û navvend a belgekirina Yabanî dicivîne . lê eywana serekîn ya xwendinê di avahiyê de , ji beşê zanînên civakî û mirovatiyê re hatî taybetkirin . Û ji beşên vê avahiyê , eywana Mîkrofîlmê û eywana pirtûkên kêm têne dîtin û giropên taybet . Û di avahiya " Cêms Medîson " de jî , eywana xwendina Efrîqiya û nexşan , pirtûkxana zagonê , sînemalivok , filmên tilivizyonê , û eywana weşanên gerok û rojnaman , û herweha eywana huneran û eywana çapemeniyê û wêneyan heye . Û di avahiya " Con Ademz " de jî eywana xizemguzariya bazirganiyê û eywana zanîn û tênîlociya heye .

Di pirtûkxana kongirês de , mezintirîn pirtûkxana bi taybetiya zagonê heye , yanê dora (4.2)milyon belgeyî tê dîndin . Ew jî vedigere rola ku ji bo wê ev pirtûkxana hatiye damezrandin , ku weke pirtûkxaneyeke jêderî xizmeta endamên Kongirês bike . Weha xelkê Emrîka xwestin dewleta xwe li ser bingehên zanistî damezrînin . Herweha di wê pirtûkxanê de , mezintirîn çapemeniyên pêşî yên Ewropî , wek sed pirtûkên zarokan ên tewrî entîke di cîhanê de , çûktirîn pirtûk di cîhanê de , ya ku pelên wê bi serê derziyê tê qulibandin , û mezintirîn pirtûk jî lê tê dîndin . Û weha /0.2/ milyon dengên hatine wergirtin (seclandin) heye , yanê cîhan tev bi zanînên xweve , di vê pirtûkxanê de ye , û roj ji rojê jî pêşve diçe . Bi vê rengî miletên li pêş ne tenê pirtûk û zanistiyên cîhanê kom kirine , wan xwendine jî . De ka em Kurd jî hinekî şopa van miletan bigirin , bi pê zanîn û zanistiyê kevin .

Kovar Elerebî , hejmar /600/ . 2008 gotara Dr .Xalêd Ezb . Wergerandin : Memê Alan